Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1200 1-Îlon-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Armanca min zindîkirina hunera bilûrvaniyê ye’

**Hunera bilûrvaniyê yek ji kevintirîn hunerên herêmê ye ku bi riya bilûrvanan hatiye heta roja me ya îro. Demhat Elî jî yek ji blûrvanên kurd e ku ji bo parastina hunera bilûrvaniyê kar û xebatê dide meşandin.**



Bilûr, heta niha weke enstrumaneke şivanan hatiye nasîn û bi gotinên pîpikê henek pê hatine kirin. Her wiha bi flûtê ya rojavayê tê tevlihevkirin. Bilûr, heta van rojan hatiye û di orkestrayan de bi hezkirin tê guhdarkirin. Niha jî bûye enstrumaneke lêxistinê ya hemdemî. Ev bi hezaran sale ev çanda ku bûye awaza gelek hestan li gel çem, çiya û dengê çûkan li Kurdistanê diherike. Li vê qadê her demsalek gelî, newal û qeraxên Çemê Dîcleyê bi rengên curbicur ên efsûnî dixemilîne û bala mirovan dikişîne ser xwe. Ev xemla bedew jî bi guhdarkirina awazên bilûrê bedewtir dibe.

Yek ji bilûrvanê Rojavayê Kurdistanê ku heskirina vê hunerê ji bav û bapîrên xwe girtiye, ciwanê bi navê Demhat Elî ye. Demhat di sala 1998`an de li gundê Kaniya Hespê ya girêdayê bajarê Serêkaniyê ji dayik bûye. Demhat ji zaroktiya xwe ve ji hunerê hez kir, di temenê 14 salî de dest bi karê hunerê kir. Ji ber ku bav û apê wî li amûrên wekî tembûr û bilûrê didan, wî jî hez kir ku fêrî hunera bilûrvaniyê bibe.

Di derbarê hunera bilûrvaniyê de, bilûrvan Demhat Elî ji rojnameya me re axivî.

Demhat Elî di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Min di 14` saliya xwe de dest bi karê huneriyê kir, ji ber ku hezkirina min ji tenbûrê re pir hebû, min dixwest bi hunera xwe xizmeta doza gelê xwe bikim. Di sala 2014`an de min ji bo pêkanîna xwesteka xwe ya hunerî tevlî xebatên Çand û Hunera bajarê Serêkaniyê bûm û ev yek heya sala 2019`an dewam kir. Piştre min nêzî 3 mehan perwerdeya Gîtarê di akademiya şehîd Yekta de dît. Her wiha bûm mamosteyê tembûr û gîtarê.”



Di sala 2019`an de dema ku êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser bajarê Serêkaniyê dest pê kir, malbata Demhat jî wekî bi hezarên malbatên din yê bajar, koçber bû û li navçeya Amûdê bi cih bû. Di wê di demê de amûra ku herî zêde bala wî kişand bilûr bû.

Demhat axaftina xwe wiha domand: “Wê demê min pir hewil da ku ez bibim bilûrvanekî jêhatî. Bê guman bi xwestek û israra xwe ez gihaştim armanca xwe û fêrî bilûrê bûm.”

**‘Huner xwedî bandoriyeke mezine li ser civakê’**

Demhat Elî wiha li axaftina xwe zêde kir: “Huner bandorekê mezin li ser civakê dike, di encamê de jî têkiliyeke xurt di navbera huner û jiyana civakî de çêdike. Weke ku me bi rêya hunerê dîrok ava kiriye, di heman demê de huner parastina wê dîrokî jî dike. Ji ber ku civaka çand û hûnera xwe ya resen diparêze, ew civak xwe ji her kesî re dide nasîn. Wekî kesayeta min jî huner ji min re nasnameye, kesî ku parastina hunera xwe neke bê nasname dimîne.”

**‘Erka me parastina hûnerê ye’**

Bilûrvanê kurd Demhat Elî axaftina xwe wiha qedand:”Erka hemû hûnermendan e ku parastina hunera xwe bikin, muzîka me kurdan bi taybetî di riya dengbêjan re hatiye heyanî roja me ya îro, gerek em wek hûnermend ne tenê biparêzin, pêwîste em muzîka kurdî bi pêş bixin, bê ku em ji rêza muzîka resen derkevin, ev gelek girînge ku mirov li ser kar bikin ta ku nifşê hunermendên nû werin û bi muzîkeke resend dest bi hunerê bike û hunera kurdî bi pêş bikeve.”

## Pirtûka ‘Hevrêyê Rojê Mam Zekî Şengalî ’ wergerê kurmanciya aramî bû



Pirtûka bi navê ‘Hevrêyê Rojê Mam Zekî Şengalî’ ya bîr û baweriya Êzidiyan, ferman û komkujiyan, jiyan û têkoşîna wî Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Zekî Şengalî (Îsmaîl Ozden) vedibêje, ji derveyî zimanê Tirkî û Kurmanciya latînî, bi Kurmanciya aramî jî hate wergerkirin. Pirtûka bi kurmanciya aramî wê di demeke nêz de çap û belav bibe.

Pirtûka ‘Hevrêyê Rojê Mam Zekî Şengalî’ ku Tebaxa 2022’an bi nivîskariya Mehmed Ozcan li weşanên Meyman (kurmancî-latînî) çap bû, di salvegera şehadeta Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Mam Zekî Şengalî (Îsmaîl Ozden) de bi kurmanciya aramî jî werger bû.

Pirtûk ku zimanê wê yê orjînal Tirkiye û ji bo kurmanciya latînî werger bûye, îsal li Başûrê Kurdistanê ji bo kurmanciya aramî jî hate wergerkirin û dê li Şengal û Başûrê Kurdistanê were çapkirin û belavkirin.

Pirtûk ji kurmanciya latînî ji bo aramî ji aliyê Takor Zerdeştî ve hatiye kirin û di naveroka wê de bîr û baweriya Êzdayetî, sedema ferman û komkujiyan, berxwedana Êzidiyan ya li hember fermanan, tevlîbûna têkoşîna azadiyê ya Mam Zekî Şengalî ya di vê oxirê de, xebatên wî yên ji bo Şengalê û bi giştî jî Êzidiyan vedibêje.

Pêşgotina pirtûkê ji aliyê rêhevala wê ya têkoşînê û Endama Konseya Serokatî ya KCK’ê Sozdar Avesta ve hatiye nivîsîn.

Pirtûka bi kurmanciya aramî (behdînî), wê di demeke nêz de were çapkirin û li Şengal û Başûrê Kurdistanê were belavkirin.

Sudoku: Bersiv 3

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 1 | 5 | 7 | 8 | 9 | 2 | 4 | 6 |
| 8 | 6 | 7 | 3 | 4 | 2 | 1 | 5 | 9 |
| 9 | 4 | 2 | 6 | 1 | 5 | 8 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 8 | 5 | 9 | 1 | 4 | 2 | 7 |
| 1 | 2 | 4 | 8 | 7 | 6 | 3 | 9 | 5 |
| 7 | 5 | 9 | 4 | 2 | 3 | 6 | 1 | 8 |
| 4 | 7 | 1 | 9 | 3 | 8 | 5 | 6 | 2 |
| 5 | 9 | 3 | 2 | 6 | 4 | 7 | 8 | 1 |
| 2 | 8 | 6 | 1 | 5 | 7 | 9 | 3 | 4 |

Sudoku:Pirs 4

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | 4 | | | | 5 |
| | | | 2 | 5 | | | 8 | |
| | 3 | 8 | 7 | 6 | | 2 | | |
| | | 7 | | | | 1 | 5 | |
| | | 5 | | | | 4 | | |
| | 1 | 6 | | | | 3 | | |
| | | 4 | | 3 | 7 | 6 | 2 | |
| | 6 | | | 2 | 4 | | | |
| 8 | | | | 9 | | | | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Dikana Beko, kîloyek mewîj û du qalib sabûn:**
- Pir xwe qure dike, pir pesnê xwe dide, lê ne wisa ye.

**Hem keçel e hem qure:**
-Tiştekî wî ku xwe pê qure bike nîne, lê dîsa xwe qure dike.

**Ji tazîtî ketiye kuwarê dibêje kirasê min ne dîlan dîlan be min navê:**
- Tiştên piçûk bi dest nakevin ew doza yên mezin dike.

**Kelhî ne, lê tiştek li mala wan nîne:**
- Qure ne, pozbilnd in lê nan nîne bixwin; hem qure ne hem birçî ne.

**Kevnikên xelkê li xwe dike, li gasînê zincîra xwe li ba dike:**
- Xizan e lê qure ye.

**Kum û koloz li serê wî ye, xaniyê wî bê pencere û derî ye, zarok tazî ne birçî ne, jin kurtêlan pars dike, neçar e bêxwedî ye:**
- Hem qure ye, hem xizan e.

**Kurtekê wî çox e dew nîne bixwe:**
- Di mala wî de nan nîne bixwe doza tiştên mezin dike.

**Livaxwaz e liva reş dixwaze:**
- Hem parsê dike hem tiştên dixwaze dineqîne; qîma xwe bi her tiştî jî nayne.

**Liva:** Hiriya berxan.

**Malê nîne evranok navê jinikê dîndarok:**
- Di mala wî de nan nîne bixwe doza tiştên mezin dike.
Nanê ceyî dixwe tirên polayî dike.
- Hem xizan e hem qure ye.

**Nanê bêxwê dixwe tirên şor dike:**
- Bin heman wateyê.

**Noka genî çû bajêr bû leblebî:**
- Dema yekî xizan piştî dewlemendiyê xwe qure dike, yan eslê xwe inkar dike hingê tê gotin.

**Noka me çû bajêr bû leblebî:**
- Bi heman wateyê.

**Parseke e, bi şûr û qetek e:**
- Hem tiştekî wî nîne, hem doza mezinayiyê dike.

**Pars kir li ber deriya, da xêra miriya:**
-Ew bixwe xizan e dibêje ezê alîkariya xizanan bikim.

**Parsek û kodik bi şûn qûnê ve:**
- Hem parsê dike hem şerm dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Jinên rojnamevan û jinên pêşeng tirs xistine dilê dijminan’



Nûnera Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê, Sûad Hiso da zanîn ku jinên rojnamevan û jinên pêşeng yên kurd, tirseke mezin xistine dilê hemû hêzên desthilatdar, bi taybet dewleta Tirk a dagirker.**R-2**

## Şoreşgerê bêwestan; Tekîn Goyî



Şoreşgerê kurd Tekîn Goyî bi tevlîbûn, helwest, têkoşîn û rûmeta xwe ya fermandariyê navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka têkoşîna şoreşa Kurdistanê û gelên herêmê de nivîsand.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1200 1-Îlon-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# RAMANÊN RÊBER APO HIŞMENDIYA DESTHILADARAN HEJAND

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ji bo mirov û civakên bindest li hemberî zilm û neheqiyê serî hilda û têkoşîna parastina rûmeta mirovahiyê da meşandin. Bi îradeyeke bêhempa pêşengiya mirovên azad kir û bawerî û hêvî afirand. Bi fikir û felsefeya xwe ya azad civak ji tarîtiyê rizgar kir û hişmendiya baviksalariyê ya zordest hejand. Gelê kurd û tevahiya gelên azadîxawaza jî, heqîqeta hebûn û azadiya xwe di fikir û pergala Rêber Apo de dît. Ji ber wê li derdora felsefeya wî kom bûne û azadiya Rêber Apo wekî azadiya xwe dibînin.**R-4**




## Kevirên girêdayî îşareta êrîşa kûçikên serberdayî ne




Di 23’yê Tebaxa 2024’an de, li Başûrê Kurdistanê navçeya Sadiqê balafirên bêmirov yên Komara dagirker ya Tirk li erebeya rojnamevanan da. Di vê êrîşê de rojnamevan Gulîstan Tara û Hêro Bahadîn hatin şehîdxistin û nêzî 6 kesan jî birîndar bûn.**R-5**

## Paqijî erkê tevahî civakê ye



Paqijiya giştî li gund, bajar û taxan berpirsyartiyeke kolektîf e. Pîvanên bingehîn yên jiyanê ne û pêwîste ji zarokatiyê ve were pêşxistin û bibe mîna çandekê di nava civakê de.**R-6**

## ‘Huner exlaqê civakê ye’



Hunermend û pêşkêşvanê bernameyên hunerî Cemal Tîrêj bibîrxist ku beriya Tevgera Azadiyê xwe rêxistin bike li Rojavayê Kurdistanê hunera kurdî qedexe bû û gel bi tirseke mezin bi zimanê xwe diaxivî.**R-7**


Sîpan Şinda
**Paleyî**
R-7

# ‘Jinên rojnamevan û jinên pêşeng tirs xistine dilê dijminan’

Nûnera Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê, Sûad Hiso da zanîn ku jinên rojnamevan û jinên pêşeng yên kurd, tirseke mezin xistine dilê hemû hêzên desthilatdar, bi taybet dewleta Tirk a dagirker. Herwiha Sûad Hiso diyar kir ku armanca dewleta Tirk û PDK’ê ew e ku bi hedefgirtina jinan, bêvîn û hêzbûnekê li cem jinan ava bikin, hem jî wan ji civakê qut bike.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Hedefgirtina jinên pêşeng, rojnamavanên jin kiriyarên ku bi awayekî rojane li Başûrê Kurdistanê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û PDK’ê ve tên kirin. Di derbera vê mijarê de, nûnera Yekîtiya Êzîdiyên Sûriyê, Sûad Hiso pirsên rojnameya me bersivand û hevpeyvîn wisa bû:



**-Sedema hedefgirtina rojnamevanan li Başûrê Kurdistanê ji milê PDK’ê ve tê çi ye?**

Mijara hedefgirtina rojnamevanan ji demeke dirêj ve ye, bi dirêjahiya dîrokê re, rojnamevanên jin û kesên azadîxwaz ên pêşeng li Başûrê Kurdistanê kar dikin ji aliyê PDK’ê ve tên hedefgirtin. Bi taybet jinên pêşeng û jinên rojnamevan ku dixwazin guhertinê li Başûrê Kurdistanê çêbikin û rastiya gelê kurd, diyar bikin. Herwiha çi kesê ku rastiya PDK’ê derdixe ji raya giştî re, rasterast ji aliyê PDK’ê ve tê girtin an jî kuştin. Ji vê yekê xerabtir, çi rojnamevanekî/e ku hewl bide dengê rastiyê eşkere bike, PDK’ê bi riya sîxurên xwe agahiyan dide dagirkeriya Tirk û dewleta Tirk jî wî/ wê hedef digire. Li Şengalê me dît ku çawa rêheval Nûjiyan a rojnamevan a ku kiriyarên PDK’ê derdixist, hat hedefgirtin. Berî demekê dewleta Tirk a dagirker bi vî hawî rojnamevanên Raghandina Azad yên jin, şehîd xistin. Berî çend mehan jî rojnamevanên Stêrk TV li Şengalê hatin hedefgirtin. Berî wan jî edîtorê ROJNEWS’ê, Silêman Ehmed ji aliyê PDK’ê ve hat revandin di encamê de cezayê 3 salan lê hat birîn. Bi vî rengî PDK’ê bi rengekî eşkere tevkariya dewleta Tirk dike. Hewiha PDK’ê bi riya ajantî û sîxurtiya xwe ya bi dewleta Tirk re şerê şoreşger, pêşengên jin û tevahiya gelê kurd dike.

**-Tundiya li hember jinê û hedefgirtina rojnamevanên jin û jinên pêşeng tê çi wateyê?**

Dewleta Tirk di serî de û hemû dijminên gelê kurd yên desthilatdar, hertim li pêşiya sekna jinan rawestiyane û kirine hedef. Destpêkê divê em li ser berxwedamiya jinê ya bêhempa biaxivin. Wekî em dizanin, bi destpêkirina Şoreşa Rojava re YPJ’ê ew xwenên radîkal yên avakirina dewleta DAIŞ’î bi dawî kir. Di heman demê de jî, jin bû pêşenga şoreşa 19’ê Tîrmehê, hem jî vîn, karîn û hêza xwe ji bo tevahiya cîhanê da tekez kirin. Li aliyekî din jinê bi felsefe û slogana ‘Jin Jiyan Azadî’ cîhan bi giştî xist bin bandora xwe. Lewma bi dirêjahiya dîroka berxwedaniya jinê dît ku bi dehan jinên kurd yên pêşneg û rojnamevan, bûn hedefa hêzên desthilatdar di serî de dewleta Tirk a dagirker. Nemazeya van pêşengan, şehîd Hevrîn Xelef, rêheval Nûjiyan, Çîçek, Sosin û hwd… Hêjayî gotinê ye ku jinên kurd bi heybet û cesaret in, lewma hertim tên hedefgirtin. Bi vê sedemê dewleta Tirk jinên pêşeng şehîd xistin, armanc jî ew e ku vîn, hêz û cesareta jinên kurd yên pêşeng bişkîne. Di heman demê de jinên pêşeng yên ku bandoreke mezin dane avakirin, ji civakê qut bikin û bêbandor bikin.

**-Li hember tundî û hedefgirtina ku li ser jinê tê meşandin erkê ku dikeve ser milê jinê û civakê çi ye?**

Jina kurd di roja îro de riya azadiyê, fikrên azad, perwerdeyê û parastina nirxên pîroz yên şehîdan nas kiriye. Ev yek jî bi saya xeta bîrdozî ya YJA-Star û felsefeya Rêber Apo bû. YJA-STAR xwedî roleke bingehîn bû ji bo pêşxistina jinan, wê li ser raman û terzê Rêbertî jin û gel perwerde kirin. Herwiha hewldaneke mezin kir ji bo azadiya jinê û tevahiya civakê, hem jî hêza me xurt kir ku em li dijî tecrîda li ser Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan derkevin. Di encama xebat û hewldanên jinê yên ku bi dihên salan hatin kirin, bedelên giranbuha hatin dayîn, ew jî keda hevalan û xwîna şehîdan bû. Êdî jina kurd destkeftî, erk û xebata xwe nas kir, tevlî hemû warên jiyanî bû çi leşkerî, aborî, siyasî, civakî û hwd… be. Di vê çarçoveyê de di nav Şoreşa Rojava de û Tevgera Rizgariya Kurdistanê gavên pîroz û bi nirx avêtin pêş. Li ser hîmê felsefeya “Jin Jiyan Azadî ” ya ku bi saya raperîna Jîna Emînî û tevahiya jinên azadîxwaz, rihê berxwedanê li cem jinên cîhanê hat çandin. Beriya çend rojan li ser hedefgirtina jina ku li Hindê rûda, bi dehan jinên azad, durşmeya “Jin Jiyan Azadî ” hildan jor û banga mafê jinan kirin. Lewma em dibînin ku xebata jinê di salên dawî de û roja îro dike xebateke bi nirx e, divê destpêkê riya vê xebat û bîrdoziyê bidomîne. Herwiha da ku kiryarên ku li ser jinên azadîxwaz, tên kirin, raweste pêwîste xeta azadiyê bidomîne. Di heman demê de jin û tevahiya civakê li ser ramanên Rêber Apo û YJA-STAR’ê tevbigerin.

# Rîham Heco: Armanc ji zewaca temen biçûk tunekirina jin û civakê ye

**Amara Baran/ Qamişlo**

**Zagona daxistina temenê zewicandina keçan heta 9 salî pêşkêşî perlemantoya Iraqê hatiye kirin. Berdevka Tevgera Jinên Azad yên Êzîdî (TAJÊ) Rîham Heco diyar kir ku armanc ji pwejrandina zewaca temen biçûk, pişaftina hêza jin û civakê ye.**

Li cîhanê diyardeya xerab ya zewaca zarokan roj bi roj zêde dibe û gelek welatan qanûnên ku zewaca zarokan dipejirînin derdixin. Niha jî li Iraqê behsa qanûna zewaca zarokan dike û temenê zewaca keçan dadixe 9 saliyê. Di vî çarçoveyê de berdevka Tevgera Jinên Azad yên Êzîdî (TAJÊ) Rîham Heco ji rojname ya me re axivî.

**`Di parlementoya Iraqê de biryarên ne di cihên xwe de derdikevin`**

Rîham Heco di destpêka axaftina xwe de wiha got: “jinên Îraqê û Başûrê Kurdistanê heya roja me ya îro li gorî zagonên Iraqê bê maf mane. Zagon û biryarên li dijî jinan, bi taybet li dijî jinên kurd şerekî giran tê meşnadin. Tevî ku di gelek zagonan de mafê jinê hatiya xêzkirin lê hişmendiya zilam û destheledariya heyî rê nade ku jin bi maf û misyone xwe tevbigere, hişmendiya zilam nahêle ku jin bibe xwedî îrade, biryar, zanebûn û hêz. Her dixwaze ku jinê di bin destê xwe de bide helandin û tunekirin. Her wiha di nava eşîrên Îraqê de rewşa jinan roj bi roj ber bi xerabiyê ve diçe, mijarên zewaca biçûk zêde dinav wan de hatiya belav kirin, bêgûman ev biryara zewaca temen biçûk ne tenê wê bandorî li kesayete wê zarokê were kirin, di heman demê de wê bandorekî neyinî li ser civak û malbatê jî bike.”

**`Di zagonên Iraqê de mafê jinê hatiye binpêkirin`**

Rîham axaftina xwe wiha domand: “Di zagonên Îraqê de tu mafekî jinê tuneye û bi taybet di zewcandina zarokan de, ev jî li ser zehiniyeta baviksalarî û destheledaran e. Ewqas êriş û eşkenceyên ku ser jinan tê kirin, sedem ew e ku di roja îro de gelek jin radibin ser piyan û doza mafê xwe dikin, di heman demê de jin bi hemû hêz û îradeya xwe li hemberî sîstema desthilatdar û dagirker disekine, jin niha di nava tevger û tekoşînekî pir mezin de ye. ji ber vê yekê biryara hatiya dayîn ku jin êdî bi temenekî biçûk were zewcandin, da ku jin bi rêya zewaca temen biçûk bidin tune kirin û rê li pişiya wê bigirin. Dewletên desthikatdar her dixwazin ku mêjiyê jinê bi zewac û xwedîkirina zarokan bide mijûl kirin, rastê niha rojeva piranî jinê Îraqê buye zewaca temen biçûk, yanê gavên ku jin avêt û xwe pêşxist.”

**`Armanca biryara zewaca temen, biçuk tunekirina civakê ye`**

Rîham balkişand li ser armanca biryara zewaca temen biçûk û pêde çû: “Zewaca temen biçûk tunekirina civakê ye. Mijara zewaca zarokên 9 salî, mijareke girêdayî hişmendiyê ye. Pirsgirêka hişmendiyê jî li ser malbatan û civakê dimîne. Ger dayikekê ku keçeke 9 salî bide zewicandin ew pirsgirêka qirkirin û qetilkirinê ye, ji bo wê jî divê mijarê de ji Hikumetê zêdetir, pêwîste jin rol û misyona xwe bileyîze di pîvanê civakê de, herwiha pêwîste ev tişt werin qedexekirin û ev qanûn werin rakirin.”

**`Li Iraqê di salane 20 hezar jin têne berdan`**

Rîham wiha domand: “Pêwiste hemû civak bi riya baweriyê nekeve xefikên dewletê, dewlet dixwaze civakan bi xwe ve girêbide û ji pêvan û civakbûyînê derbixe, ev yek dibe qirkirina civakan, di roja me ya îro de em dibînin xort û keçê tev hev li ser piyane û dibêjin em ê tu carî van biriyaran nasnekin û ne kevin van xefikan de. Ev qanûn ne tene ji bo keçikan, ji bo xortan jî derbasda re, roja me ya îro de dema em li nav civakê mêyze dikin keçeke 12 salî bi kureke 13 salî re zewiciye, encamê zewacawan gelek tiştên neyînî bixwe re tîne. Ji ber ku hê zarokin wata zewacê çi ye nizanin, tenê weke rojeke şahî ango dawetê digrin dest û hemû zewacê bi vî renge xeyal dikin. Pişte ku dizewicin hevre famkirin çênabe û bi hevre nikarin jiyan bikin û hevdû berdidin. Li Iraqê herê kêm salê de 20 hezar jin û zilam hevdû berdidin û gelek ji wan zarok di ortê de dimînin û dibin qurabnên van biryaran. Di roja me ya îro de bi hezaran zarokên ku bê malbat mezin bûne hene, ev jî dibe sedem ku li hemberî civaka xwe dijminatiyê bikin.”



**`Pêwîste civak nekeve xefika dewletê`**

Riham di dawiyê de bang li hemû jinan kir û wiha got: “Ez bang li hemû civakê dikim, pewîste civak nekeve xefika dewletê, ez denge xwe digihînim tevahî jinan çawa ku di roja me ya îro de li hemberî her cure zext û zoriyê disekine û serî hildide îro dikare li hember van biriyaran jî serî hilde û bibêje bese ji zilma we re, ev yek di serî de dikeve ser milên tevgerên jin de her wisa aktivîst rojnamevan û her rêxistineka jin di kur hebe dikeve ser milê wan bi her awayî li dijî van biriyran derbikevin.”



# ‘Huner exlaqê civakê ye’

Hunermend û pêşkêşvanê bernameyên hunerî Cemal Tîrêj bibîrxist ku beriya Tevgera Azadiyê xwe rêxistin bike li Rojavayê Kurdistanê hunera kurdî qedexe bû û gel bi tirseke mezin bi zimanê xwe diaxivî.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Derbarê pêşketina çand û hunera Kurdi ya resen û pêşketina hunera şoreşgerî ya li Rojavayê Kurdistanê de hunermend û pêşkeşvanê bernameyên hunerî Cemal Tirêj ji rojnameya me re axivî.

**‘Stran û hunera kevin bi saya Rêber Apo hat parastin’**

Hunermend û pêşkêşvan Cemal Tîrêj da diyar kirin ku beriya Tevgera Azadiyê bê damezirandin, çand û hunera Kurdî ber bi qirkirinê ve diçû û wisa destpê axivtina xwe kir: “Bi sala ne, çand û hunera Kurdî ya resen ji aliyê gel ve tê parastin. Stran û çîrokên berê piranî ser evîn û eşqê û ser kesayatên axa û mîran dihatin sitrandin. Çîrokên efsûnî yên wekî, Mem û Zînê, Xecê û Siyabend, Derwêş û Edûlê hwd. Çîrokên wisa jî dihatin gotin. Em dikarin bêjin stranên ser welatparêzî, şoreşgerî nexasim çanda Kurdî bide xuyakirin nedihate gotin. Çanda Kurdî berê lawaz bû, ji ber Rojavayê Kurdistanê di bin desthilatiya rejîma Bees de bû. Gel nedikarî bi rehetî gel zarokên xwe bi zimanê dayika xwe baxive. Serdema 2’emîn jî ji ber ku netewîbuyinek tine bû. Demekê şûndatir hunermendê ku bikarin çanda Kurdî bidomînin jî derketin holê. Wek Mihemed Arifê Cizrewî, Hesen Cizrewî hwd. Destpêkirina şoreşên Kurdistanî de carna hin hunermendan li ser pêşengen serhildana stran çêdikirin. Li ser kesayatên weke Şêx Seîd, Simko Şikakî yên ku mohra xwe li ser şoreşên Kurdistanê danabûn dihate çêkirin û gotin. Lê ev jî di asteke lawaz de diman. Ev stran ne digehiştin di asteke netewî de. Em jî wekî kesayet wê çand û hunerê mezin bûn. Heya ku 15’ê Tebaxa 1984’an de ya fîşeka yêkemîn ji aliyê fermandarê mezin Egîd (Mahsûm Korkmaz) ve hat teqandin. Vê vejînê bandora xwe li her çar beşên Kurdistanê kir. Bû sedem ku çand û hunera kurdî de ji pêşketinek mezin çê bibe. Wê bandorîyek mezin li ser hunera kurdî ji ava kir. Di salên 1989 û1990’î de strana yekemîn Ji aliyê Koma Berxwedan ya bi navê Botan hat çêkirin. Wê demê em matmayi man. Di wan deman de Tevgera Azadiyê xwe Rojavayê Kurdistanê nû rexistin dikir. Dijmin ji bona gel derdorê xeleka azadiyê kom nebe, propagandaya dijber dihat kirin. Berê tirs û xofek mezin hemberî çand û hunera kurdî dihat jiyan kirin. Di sala 1980 û 1981’an de li Rojavayê Kurdistanê de komên stranan hatin avakirin. Koma yekemîn ya ku li Rojavayê Kurdistanê dihate damezirandin bi navê Koma Şoreş bû. Di 1990’î de bi şêwazeki fermi me, Newroz li Rojavayê Kurdistanê pîroz kir û pêşkeşvan jî Seydayê Tîrêj bû. Ev hunera resen ya kurdî bi saya Rêber Apo û Tevgera Azadiyê hat parastin.”

**‘Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê pêngavên mezin di aliyê çand û hunerê de hat avêtin’**

Cemal Tirêj wiha berdewam kir: “Di destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, ji aliyê çand û huner de pêngavên mezin hatin avêtin. Ne tênê Rojavayê Kurdistanê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî bandor kir. Lê dîsa ji kêmanî hene. Ne li gorî asta çandê ku Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan daye xuyakirin. Ev pêşketinên di aliyê çand û hunerê de tevahî Kurdistanê ji bandor kir. Ev çand û hunera resen bi hemû pêkhateyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê digirt bin sîwana xwe. Ez wek rexne jî, ji bona hem pişeyên xwe yên hunermend, pêşkêşvan û hemû xebatkaran dikim ku di asta teng de nemînin bikarin xebatên xwe pêş bixin û xebatên xwe de tevlîbûnan bidin kirin.”

**‘Ruxmê hemû astengiyan em ê xebatan pêş bixin’**

Cemal Tirêj da xuyakirin ku asta çand û hunera kurdî pêwîste bê pêşxistin, ji bona zarok û ciwanên Kurd bi çanda xwe mezin bin û wiha domand: “Di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xebatên berbiçav dimeşin. Astengî wek hemû xebatan de heyî li wê xebatê de ji xwe dide pêş. Lê ger em astengiya nedin berçav em nikarin kar û xebatê xwe yê şoreşê de pêşketine ava bikin. Derfetên me pir hene. Navendên me yên çand û hunerê komale û saziyên me ji hene. Dibe em di van derfetan baş bikar bînin. Jibona zarok û ciwanên me, keç û xortên me bikarin çanda xwe mezin bibin. Em bikarin di civaka me de hunermend û gelê me yê ku hunerê we mijûl dibe, em peyda bikin û wana tevlî bikin. Derfetên me yên ragihandinê ji pir bûne yên ku hezbikin çand û hunerê pêş bixin dikarin bernameyên cûr be cûr pêşkeş bikin. Ev şoreş û Tevgerê derfet afirandiye ji bona em xwe di her alide pêş bixin. Hunermendên kevnar yên weke Tehsin Taha, Mihemed Şêxo hwd, niha jiyan bikirina dê pêşketinên pir cûda hatiban dest xistin. Em ji wek şopinerên wan em rêya van bi şopînin kar û xebatê çandê berfireh bikin.”



**‘Pêwîste hunermend xwedî li civakê derbikevin’**

Cemal Tirêj axaftina xwe wiha qedand: “Rêber Apo jibona huner û hunermendan wiha pênase dike ‘Hunermend exlaqê civakê ye.’ Ev me dide diyar kirin ku hunermendê huner pêş bixe, heman demê de exlaqê ji pêş dixe. Xwedî derketina hunera çanda resen nûjen kirine. Civaka me civake kê şoreşê ye. Her malbate kê şoreşê re berdel daye û tevlîbûnên xebata hene. Welatiyên ku niha li axa Rojavayê Kurdistanê de mane û welatê xwe ne terikandine şervanên şoreşê ne. Bangawaziya min ji bona Hunermendên Kurdistanê tevahî xwedî nirxan derbikevin. Bila hunermend ne bije ti kes me guhdar nake, beruvaji ger te xwe da guhdarkirin tu dibe pêşengê civake. Hunermend ger li gor nirxên civakê berhem dan avakirin dê ev qasî bên guhdar kirin jî. Gelek hunermend hene ji heya roja îro jî bêdengin. Em li van ji daxwaz dikin ku tevlî xebatên şoreşê bibin û piştgrî bidin gelê xwe.”

# Wêje rih û nasnameya civakê ye!

**Cîger Dilşad**

Heger em bêjin ku; “Şoreşa Kurdistan’ê bi pêşengtîya Rêber APO wekî şoreşa vejînkirin û afrandina wêjeya civakî pêşket”, wê ne şaş be. Her çiqas alîyê têkoşîna leşkerî derketî pêş jî, lê rastî ew e ku, ji ber mercên Kurdistan’ê û tunehesbandina ji binî ve ya Kurdan, Rêber APO di serî bi têkoşîna birdozî hewl da ku, toz û xûbara li ser rastîya Kurdan rake û hebûna Kurdan wekî gel di serî de bi Kurdan pişt re jî bi neyarên Kurdan bide pejirandin. Bê guman ev, ne karekî hêsan e. Hêj çavên xwe venekirine, hêj kom tam nehatî serhev, bi êrîşên şovenîstan û rêxistinên ku bûbûn dûvik ji MALBATA BERZANÎ re rû bi rû ma. Bi kurtasî xwe di nav şerkî pir dijwar de dît. Destpêkirina şer ne ku şer çêtir dît û hema xwest şer bike. Şer li ser Rêbertî û Tevgera Azadîyê hate ferz kirin.

Li welatên din yên mîna Rusya ji berîya şoreşê wêjeyeke wan ya niviskî xurt hebû. Mixabin li Kurdistan’ê romaneke ku kesayeta netewî, welatparêz derxîne holê, dahûrandina civakê dike tune bû. Ji lewra Rêber APO pêşîya pêşîn kesayet dahûrand. Kerekterê/a ku wê şoreşa Kurdistan’ê bigihîne serkeftinê afirand û rastîyên civakî ji nûh ve derxistin holê. Ji lewra jî bi dehan şoreş di nava şoreşa Kurdistan’ê de hatin çekirin û têne jîyan kirin.



Bi taybetî jî şoreşa Jinê, ku dayîka hemû şoreşan e, reng, şêwe û cewherê wêjeya şoreşa Kurdistan’ê jî dîyar dike û wêjeya Kurdistan’ê heger ne li gorî felsefa Jineolojî yê be, negengaze ku ji civakê re bibe bersiv û rista xwe bilîze. Ji ber ku şoreşên bi birdozîya sosyalîzma ku dewletxwaz,bi tenê wekî şoreşên rizgarkirina ji bin hûkmê desthilatdarekî bûn, wêjeya wan jî ji ya heyî nebûrî û di encamê de gava em li rewşa jinê ya piştî şoreşê binêrin, em dibînin ku di wêjeyê de hema weke xwe maye. Ji lewra heger wêjeya Kurdistan’ê ne li gorî Jineolojîyê be, bi ilm û fesefa Rêbertî yê ya; “asta azadbûna jinê asata azadbûna civakê dîyar dike”, nehatibe strandin, nikare di nava wêjeya cîhanê de ji xwe re cîhekî veqetîne. Wê nikaribe ji rewşa heyî ya heşfandî xelas bibe.

Bêguman ji demekê ve ye di nava gerîla û xebatkarên şoreşê de hewldaneke mezin ji bo birqandina nirxên derketine holê di roman, helbest, destan, şano, çêrok û mûzîkê de,hene. Lê mixabin ji ber ku bi dehan cih têkoşînê dikin û timî di nava şer de ne, derfeta ku rûnin û demekê ji nivisandinê re veqetînin, nabînin.

Halbûkî berhemên derketine di serî de nirxên gel in, û divê rewşenbîr û nivîskarin Kurd vî karî bikin. Heger îro nirxên şoreşê nebiriqîn in berhemên xwe, wê kengê bibiriqîn in?

“Dema ku te civak ji hunerê qut kir, tê wateya ku te ji nasname û rih jî qut kiriye. Ya li paş dimîne jî koma tilxeya (moloz) ye.” ( Rêber APO). Ji bo ku em careke din nekevin rewşa tilxeyê,(berîya şoreşê, em wekî civaka Kurd di wê rewşê de bûn),divê em destên xwe lez bigirin û rojeke zûtir nirxên şoreşê bibiriqînin berhemên wêjeyî.

Gava em roman, helbest, destan û çîrokên klasîk bînin ber çavên xwe, em ê bibînin ku, piranîya wan di pêvajoya serûbin bûna civakan de hatine nivisandin û rasterast êş, jan û hêvîyên civakê bi siberojê tînin ziman. Her wiha pir kêm nivîskar dewlemend û jîyaneke rihet û ziktêr jîyan e. gelekên wan ji ber tunebûnê, nikarîne nanê xwe peyda bikin, an jî bi zorê debara xwe kirin e. Jixwe wêjevanekî çav berdan pereyan ew dibe her tişt lê nabe wêjevan. Halbûkî derfetên îro şoreş pêşkêş dike qet û qet ne hindik in û pir zêdene. Bi tenê li benda wêjevanên ji gelê xwe hez dikin û bi rastî jî welatparêz in.



## Paleyî

**Sîpan Şînda**

Mirovayetî hema ji xwe de û ji nişka ve negihaye vê astê. Bi hezaran salan mirova ked daye, afirandine û ji bona jiyana xwe xweştir bikine ketîne di nava tevgerê de. Heta îro ji mirovayetî di nava keftûleftê de ye ku tiştên baştir çêke, pêşvetir biçe û jiyana xwe xweştir bike.

Her çend di roja me de jiyan gelekî xweş be û her tişt di astekî gelekî pêşketî de be ji, lê belê mirovayetiyê bi hêsanî ev xweşî bidest nexistîye.

Di roja me de, bi saya serê pêşketina teknolojiyê gelek tişt hatîne guhertin û şûna mirovan êdî gelek kar ji aliyê alavên teknolojîk ve têne kirin. Bi taybetî gelek karên heta ji beriya 20-30 salan jî bi dest û milê mirovan dihatin kirin, îro teknolojî dike. Bê gûman, li gelek derên gerdûnê hê jî mirov weke karkerê sereke tê xebitandin û wê hêj jî bixebitine. Lê belê hingî roja paştire xebitandina hêza mirovan di jiyana kar de kêmtir dibe.

Dema ez zarokbûm, li nav Kurdan de karê paleyê karekî girîng bû û di demsala havînê de gelek mirov diçûn paleyî dikirin. Him di nav zevîyên dexil/genim û cehî de, him di nav yên nîsk û nokan de û him jî di nav karên din yên weke çilo, kolan û hwd. mirovan paleyî dikirin û heta êvarî di wî çilê havînê de, li ber wê tirîja tavê, paleyî dikirin. Bê goman ji bo wan kesan ne hesanî bû ku di wê germê de paleyê bikine. Lê belê çi derfetên din yên wan nebîn. Belê, ew ji tarîyê diçûn di nav zevîya genimî de heta tarîyê dirûn dikirin. Heta digotin dema tave heyîv biya bi şev ji dexil didirûtin. Ango wan rojê ji 10-12 seetan zêdetir paleyî dikirin. Carna tinê maligî diçûn, carna bi çend cîran, dost û hevalan re diçûn û carna jî gundî hemî weke zibare bi hev re diçûn. Dema bibîya zibare paleyî zewqtir bî. Li gorî rewşê dihate guhertin. Her çend paleyî karekî giran û zehmetbiya ji, lê belê zewq jî bû. Dema dest bi berûkê dirûnê dikirin, di heman demê de dest bi stranan ji dikirin. Di nav paleyan de yê herî kêrhatî dibî serpale û wî paletî birêve dibir. Û herweha yek ji dibî ringale û ew ji bi pirranî yekî çep bî. Jiber ku dema yên çep di nava palan de dirûnê bikine, dasika wan li destê paleyê rexa wan yê qirşî dikeve û ihtimale ku wî kesî birîndar bike.

Bê goman şert û mercên paleyê hene. Yek, divê dasik û qeynaxên wan hebin û xweş bin. Du, divê pale ji xwe razî bin û bikaribin beranberiya paleyên din bikine. Ango divê bikaribin bi seetan li ber berûkê dexilî de nerabine û pişta xwe rast nekine. Jiber ku gelek pale dikevine rikanê û pişta xwe bi seetan narakine û dirûnê dikine. Sê, divê melûkê paleyan şidyayî bin û pirêza wan paqij be. Di dirûtina genimî de yekdasî heye û dudasî heye. Di yekdasîyê de melûkê paleyan bi hêsanî ji hev vedibine. Lê belê di dudasîyê de melûk lêk badikeve û ji aliyê paleyî ve bi hostayî tê hûnandin. Dema li ber berûkî de stran tê gotin, pale ji gorî paletî û hunera xwe melûkê xwe bi yek dasî yan ji dudesî dihûne. Rîtmekî gelek xweş di dudasîyê de heye û pale gelekî zewqê jê distînine. Aliyek stranê dibêje û aliyê din ji li wan dizivirîne. Dîsa di paleyê de melûk rakirin karekî gelekî giran û zehmete û ev kar ji aliyê jinan ve tê kirin. Jinên melûkkêş ji hostaya xwe li gidîşa dexilî de didine xwîya kirin. Divê gidîşa wan gelekî şidayî be û genim bi yek hîzayê hatibe danîn.

Belê bê gûman nivşên nû, gelek tiştên ku ji aliyê bav û bapîrê wan ve dihatin kirin nizanine. Lê gelek tiştên ku nivşên nû ji di nava saniyan de dikine, bav û bapîrên wan nekarine bi salan bikine.

# Bihabûna kelûpelan jiyana xizanan zehmetir dike

Sedema sereke ya bilindbûna bihayên kelûpelan, têkçûna nerxê lêreya Sûrî ye. Herwiha Desteya Pêjiyaniyê ya bajarê Qamişlo jî da zanîn ku çareseriya pirisgirêkan ew e ku di nava civakê de zanebûn û bîrwerî were avakirin.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Piştî derbasbûne 12`e salan di ser kirîza Sûriyê re, ji ber şer û dorpêça heyî aboriya Sûriyê ji sedî 80`ê têk çû, her wiha bihayê lereya sûrî li hember dolarê Amrîkî pir kêm bûye. Ji ber ku tevahiya kelûpel li gorî dolar tên firotin, vê yekê barê ser milê welatiyan girantir kir û welatî bi zehmetî debara jiyana xwe dikin. Li hemberî cûdahiyên di navbere buhayên kelûpelan û ji bo kontrolkirina bazirganiyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Desteya Pêjiyaniyê gelek kar û xebatan dide meşandin. Derbarê bilindbûna bihayên kelûpelan, bazirgan û Desteya Pêjiyaniyê ya bajarê Qamişlo ji rojnemeya me re axivîn.

Bazirganê kelûpelan Xalid Enter da zanîn ku sedema bihabûna kelûpelan, bilindbûna nirxê dolare û wiha got: "Di dema dawî de, ji ber bilindbûna mezin a nirxê dolar li hemberî lîreya Sûrî, her kes rastî zehmetiyan hat, mûçeyên karmendan ji bo debara jiyana welatiyan, kême. Sedema wê jî têkçûna nirxê lêreiya Sûrî ye. Herwiha bilindbûna dolar li hemberî lêreya Sûrî zerarek gihand pazirganan jî. Ev yek jî ji ber bê istqrarbûna nirxê dolare. Zêdebûna bihayan û hilweşîna nirxê lêreyê bandoreke neyênî li ser jiyan û hêza kirînê ya welatiyan kir, ev yek jî di tevgera bazarê de eşkere ye. Li aliyekî din jî, yek ji sedemên bihabûna kelûpelan, ew e ku dikandar û bazirgan, piraniya kelûpelan ji derveyî herêmê dikirin."


Xalid Enter


Mehfûza Elî


Bengîn Ehmed

**Zehmetiyên ku welatî dibînin**

Welatiya bi nave Mehfûza Elî diyar kir ku şopandina temwînê di nava sûk û dikanan de pir lawaze û wiha got: "Di van salên dawî de, gelek aloziyên aborî derketin û di heman demê de ev alozî jî bû zehmetî li bwe jiyana gel. Her wiha gelek malbatên ku nikarin debara jiyana xwe baş bikin û gelek ji wan malbatan jî hijmara wan mezine ku gelek cara zarokên wan birçî dirazan. Ji ber ku roj bi roj kelûpel biha dibin û dolar jî bilind dibe. Her dikanek jî li gor kêfa xwe bihabûna kelûpelan zêde dike, lê ka wijdan. Her malbatek ew derfet li cem wan tune ye ku debara jiyana xwe baş biqedînin. Ji ber vê yekê pêwîste temwîn şopandina xwe di nava sûkan de û li tevahî bajar de xurt bike, temwîn bi erka xwe ya sereka na leyize."

**Zagona madeya 4`an**

Rêveberiya Desteya Pêjiyaniyê a bajarê Qamişlo Bengîn Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Bi awayekî rojane ku girûbên şopandinê derdikevin bajarê Qamişlo, her wiha rojê 3-4 girûp dikevin tevgerê de û bazaran heya astekê dişopînin. Wek tê zanîn ku şopandina me li ser kelûpelên dîrokên wan hatine derbas kirin, fatûre kontirol kirin û hwd… û li gorî pirsgirêk û kêmasiyan jî ceza di derheqê wan kesan de tên dayîn. Niha gelek gazin û rexinên gel ji bo me hene, bi taybet li ser bihabûne kelûpelan. Em wekî Desteya Pêjiyaniyê eleqadarî bi mijara bihabûnê tune ye, ji ber ku di 1`ê Nîsana 2022`an de biryara zagonî ya madeya 4 hat derxistin ku êdî bazar, sûk û tevahî cihên firotinê di aliyê bihabûnê de azad bin, ew jî ne ku bi awayekî ne wijdanî li ser gel bihayan zêde bikin."

**Sedemên Gendeliya di nava civakê de**

Bengîn Ehmed da zanîn ku di nava civakê de gelek kesên dixwazin tevlîheviyê çêbikin hene û li ser jiyana gelên xizan xwe didin jiyankirin û wiha got: "Em wekî Desteya Pêjiyaniyê heya astekê bilind me xwest ku gelek pirsgirêkan bidin çareserkirin, lê mixabin di nava civaka me de hin kes hene her dixwazin tevlîhevî û gendeliyê belav dikin. Mînaka wê jî, hin xwediyên nangihan ard ji aliyê Rêveberiya Xweser ve bi erzanî digre, da ku kêmaniya nan dernekeve û kêleka wê jî mazot jî bi erzanî dide wan, lê hin kes ji wan ard û mazotê digirin û derve didin firotin û bi bihayekî bilind, ji ber vê yekê her ku diçe kêmanî derdikevin û ev kes jî li gorî berjewandiyên xwe li ser mile jiyana gel xwe dide jiyan kirin. Çareseriya van pirisgirêkan ew e ku di nava civaka me de zanebûm û bîrwerî were avakirin. Heya ku civak wiha tevbigera û li gorî berjewandiyê xwe yê kesayetî bimîne, her wê gendelî jî hebe. Em bi hêvîne ku êdî her kes ew zehniyeta kaptalîzimê ji serê xwe derxe û bi rengekî komînal û demokiratîk tevbigere."

# Paqijî erkê tevahî civakê ye

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

**Paqijiya giştî li gund, bajar û taxan berpirsyartiyeke kolektîfe. Pîvanên bingehîn yên jiyanê ne û pêwîste ji zarokatiyê ve were pêşxistin û bibe mîna çandekê di nava civakê de.**

Di nava aloziyên ku şêniyên bajarê Qamişlo tê de dijî, ji xizaniyê, kêmbûna avê û qutkirina elktrîkê û ji xeynî wê mîna pirsgirêka paqijiyê jî cihê xwe di nava van mijaran de digire û heyanî îro jî hîn nehatiye derbaskirin.

Li gelek kolanên bajarê Qamişlo ne paqijiya kolanan bi awayekî balkêş bala mirovan dikşîne. Ji ber bermahî û gemara ku li kolanan belavkirîne, her wiha bihna qirêjiyê ya nexweş di demsala gerim a hevînê de dibe sedem ku pir nexweşî derkevin holê.

**Tax û kolan tijî çopin**

Hin taxên bajarê Qamişlo weke Hilko, Hîzama Şîmalî, li bazara Hetînê tijî çopin. Çi di nava kolanan de û di taxan de wekî din çopa ku derdora Konteynerên çopê belavkirî, nemaze zarok, jin û zilamên ku di nava Konteynerên çopê de digerin da ku tiştên weke Naylon, bermahiyên çekan û ji xeynî wê da ku ji xwe re bifroşin û kîsên çopê vekirî dihlin û belavî derdora wê dikin. Ev wêneyekî ne xweş ji bajarê Qamişlo nîşan dide



û dibe sedema gelek nexweşiyan. Ji ber ku gelek kêzikên wek mêşên qûmê li ser kom dibin ku dibe sedema nexweşiya Laşmaniyayê, ev yek dibe sedema belavbûna gelek nexweşiyên din.

Di vê dema dawî de nexweşiya Ciderî el-qîrde li gelek welatan belav bûye, pêwîste sazî û aliyên eleqdar di vê mijarê de zêdetir bixebitin û hişyariyê bidin gelê herêmê, divê zêdetir kolan û tax werin paqij kirin û parastina wan were kirin, da ku ev nexweşî neghêje welatê me, ji ber ku wê kareseteké bi xwe re bîne.

Girêdayî vê pirsgirêkê û çareseriya wê çavdêriya giştî ya beşa paqijiyê ya şaredariya Qamişlo Mihmed Reşîd Silêman ji rojnameya me re axivî.

**Pilana şaredariyê**

Mihemed Reşîd Silêman diyar kir ku şaredariya Qamişlo dest bi hemleyek paqijiyê kiriye û wiha anî ziman:" Hemleya paqijiyê ji 15`ê meha Tebaxê dest pê kir û di heman dîrokê de di meha Eylûlê de wê bi dawî bibe. Hemle ji çerxereya Basil destpê kiriye û ber bi aliyê Hîzamê ve û di nava taxa Hilko û derdorê û bazara Hetînê berdewame.

Mihemed Reşîd Silêman wiha domand:"Her roj 25 erebeyên paqijiyê di demên sibehê û êvarî derdikevin û li kolanan belav dibin, rojane em kolanên sereke û taxên biçûk paqij dikin."

Mihemed Reşîd Silêman diyar kir ku hejmara karkerên paqijiyê 125'in, dibe ku hejmara wan û wesayîtên paqijiyê ji bo projeyên paqijiyê di rojên bê de zêde bibin, projeyên me hene ku em tevahî taxan paqij bikin û çanda paqijiyê li bajarê Qamişlo di nava civakê de pêşbêxin.

Mihemed Reşîd Silêman destnîşan kir ku xebata beşa paqijiyê berdewam e li tevahî taxan bi awayekî birêxistinkirî, û ji bo rawestandina kar carnan bi sedema ku hin wesayîtên paqijiyê hewceyî lênêrînê ye, ji bilî wê kar birêxistnkirî ye li gorî bernameya ajokerên wesayîtan.

Karê Beşa Paqijiyê li ser werdiyeyên 24 demjimêran hatiye dabeşkirin, wesayîtên ji bo rakirina konteyneran ji nava bajêr hene û hin erebe hene ji bo taxan hatine dabeş kirin. Her wiha xebatkarên paqijiyê ji bo tevahî tax û rêyên sereke hatine dabeş kirin.

Derbarê pirsgirêka diyardeya jin û zarokên ku di konteyneran de digerin û belavkirina çopê derdora wê wiha got:" Ev diyarde bûye weke werşeyên kar û ji hêla hin kesan ve tê kirin, me têkilî bi desteya Hundirî kiriye da ku çareseriyê deynin".

Ji bo derengbûna wesayîtên paqijiyê û rakirina çopê bi sedema astengiyên rê di bajar de, ji bo vê yekê jî têkilî bi trafîk û komînan re hate kirin da ku bê çareserkirin.

Mihemed Silêman Reşîd diyar kir ku hejmara giliyan ya beşa paqijiyê hatiye aktîv kirin, da ku daxwazên welatiyan li hemû taxan pêk bînin û ji bo erêkirina giliyan bi awayekî bilez pêkwere.

Mihemed Silêman Reşîd destnîşan kir ku eger giliyên gel hebe di riya (Daxwaza Nivîsandinê) li navenda şaredariyê bê kirin an bi riya WhatsApp re têkilî daynin û wêneyê bi navnîşana wê re ji bona vê hejmara telofûnê (0991326495) re rêkin.

Di dawiyê de Mihemed Reşîd Silêman got:" Bi hêvî me gel parastina paqijiya taxan bikin û çopê derxînin dema wesayîta paqijiyê bighêje cihê wan, her wiha çop neyên şewitandin da ku bihnên qirêj li taxan belav nebe û nexweşiyan bi xwe re neyne".

**Paqijî berpirsyartiya her kesî ye**

Ne tenê şaredarî berpirsyarê paqihjiya tax û kolanan e lê berpirsyartiya her kesê/î ye ku li vî bajarî dijî û pêwîste ku her tev bibin alîkar di parastina xweşkbûna bajarê xwe de.

**Paqijî pêşketina gelan nîşan dide**

Gelên paqij ew gelên ku rêzdarî ji xwe û gelê xwe re digrin, dixwaze wêneyek xweşik ji yên din re nîşan bide, ji ber ku paqijî cûreyek ji exlaqê ye.

Parastina paqijiya bejahiyê erkeke divê her kes beşdar bibe, ji ber ku gelek mirov tê de jiyan dikin, her wiha paqijî mîna neynikekê pêşketina welat nîşan dide. Her çiqas ku gel parastina paqijiya bajarê xwe bike, wê ew bajar an welat pêşbikeve.

Divê mirov derdora mala xwe û taxa xwe biparêze, çopan navêje nava kolanan û bixe cihên taybet yên ji bona çopê weke Konteynerên çopê û ji xeynî wê, piştre rola şaredariyê tê ku bi erkê xwe rabe û xebatkarên di vî warî de kar dikin bi dilsozî xebat bikin.



# 'Em ê dengê gelên herêmê bi hemû cîhanê bidin guhdarkirin'

Piştî Şoreşa Rojava di gelek qadan de, Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek pêşketinên mezin di tevahiya qadan de bi dest xist, yek ji wan qadan jî qada xebatên diplomasî bû. Ji bona pakrewaniya keç û xortên Kurd bidin naskirin kar û xebatên diplomasiyê bigehinin serkeftinê kar û xebatên di asta jor de berdewamin. Cîgira Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Gulistan Elî da diyar kirin ku di asta xebatên diplomasî û peywendiyên derve pir gavên girîng hatin avêtin.

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Derbarê projeyên qada diplomasiyê a Bakûr û Rojhilatê Sûriyê Gulîstan Elî ji rojnameya me re axivî.

**'Kar û xebatên me yên diplomasiyê bê sekin berdewam dike'**

Gulîstan Elî da zanîn ku ji bona pêşxistina danasîna şoreşa Rojavayê Kurdistanê peywendiyên bi welatên derve re her diçe xurttir dikin û wiha dest bi axivtina xwe kir: "Piştî rizgarkirina axa Rojavayê Kurdistanê û Bakur Rojhilatê Sûriyê qada herî zêde giringî lê hat dayîn, yek jê qada peywendiyên derve û bi navê din qada diplomasiyê bû. Çawa di qada leşkerî de keç û xortên Kurd çeteyên DAIŞ'ê têkbirin, di heman demê de bi pêşxistina karê diplomasiyê me danasîna van keç û xortên ciwan di hemû cîhanê de kir. Peywendiyên me yên bi welatên derve û bi hêzên Koalisyonê re,vê rastiyê berbiçav dike. Beramberî êrîşên dagirkeriyê yên li ser herêmê tên kirin, gelek kar û xebatên diplomasiyê hat meşandin û gavên pir girîng di aliyê diplomasiyê de jî hat avêtin. Ev pêngava me da xuyakirin ku ev şerê hatiye kirin ne tene leşkerî bû, di her aliyên kar û xebatên



şoreşê bû.'

**'Em ê cîhanê bidin fêmkirin ku êrişên dagirkeriya Tirk terorî ne'**

Gulîstan Elî bibîrxist ku êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk li ser gelê sivîl ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê kirin, êrişên binpêkirina mafên mirovane û wisa berdewam kir: "Êrîşên dagirkeriya Tirk yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên meşandin, di asta navnetewî de her tim di rojeva kar û xebatên me yên diplomasîyê de jî cihek girîng digire. Me ji bona wan êrîşan, wêneyekî rastiyê ji bo hemû cihanê da xuyakirin. Derbarê herêmên hatine dagirkirin weke Efrîn, Girê Spî û Serêkanîyê, me di tevahiya hevdîtinên xwe de wekî êrişên dagirkirinê nirxand û pêşniyar kir ku dewleta Tirk di asta navnetewî de bê darizandin. Ji bona binpêkirina mafên mirovan me pir dosyayên taybet ji bona darizandina dewleta Tirk û çeteyên DAIŞ'ê di dadgehên navnetewî de amade kirin. Ev kiryarên dewleta Tirk bi ispat û dîmen wekî rapor ji aliyên peywendîdar ve hatin nîşandan. Pêşketinên di asta diplomasiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de çi asta leşkerî de be, çi asta aborî û siyasî de be, tên niqaşkirin û rojevkirin. Ev êrîşên hovane yên dagirkeriya Tirk çiqas zerera madî daye gelên sivîl hatine belge kirin. Ji bona aramiya jiyana gelên me yê herêmê di aliyê diplomasiyê de çi erk dikeve ser milê me, em ê pêş bixin. Ev dewletên ku dibêjin em dostên Kurdan e, em pirsgirêka Sûriyê wek pirsgirêka xwe dibînin, hevdîtinên girîng bi wan re hatin kirin. Peywendiyên me li gel gelek welatan jî xurttir bûne. Gelek welat û dewletên navdar jî soz dane ji bona bi lezgînî pirsgerêka gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê çareserkirin. Bê guman em ji wê rewşê agahdarin ku hindek berjewendiyên dewletan dibe sedem ku li hemberî wan êrîşan bêdeng bimînin. Astengiya bingehîn yên ku xebatên me yên diplomasiyê, berjewendiyên dewletên derve yên bi dewleta Tirk ya dagirker û Hikûmeta Şamê re ye. Ev dibin sedem carnan hin mjarên berjewendiyên gel diparêzin bên paşguh û taloqkirin.'

**'Ji bona Statûya Rojava û Bakur Rojhilatê Sûriyê em ê kar û xebatê xwe pêş bixin'**

Gulîstan Elî derheqê projeyên demên pêş de agahiyên girîng dan û wiha domand: "Em ê wekî xebatkarên karê diplomasiyê heya dawiyê kijan welat mabe, kijan kesayetên navdar hebe ji bona berjewendiyên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê peywendiyan pêk bînin û xorttir bikin. Ev demên dawîyê gelek welatî hatin qetil kirin û gelek ji wan jî koçber bûn. Ev kiryarên wisa yên asta tometbariyê ne. Pêwîste di asta navnetewî û cihanî de dadgeh bê avakirin û bên darizandin. Hewildan û karê me hemû dê li ser xurtkirina xebatên bidome. Heya Statuyekî fermî bê destgirtin, her deriyê ku heye em ê lê bidin û niqaşên pêwîst bidin meşandin. Em ê wê zextê li welatên ku em karê diplomasiyê pêre dimeşînin, mafên mirovan yên navnetewî bi wan kiryarên dewleta Tirk weke terorî û jênosid bidin pejirandin. Mijarek din jî ya çeteyên DAIŞ'ê yên di girtigehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tên girtin, piraniyên wan niştecihên Ewropa û welatên derve ne. Ev çete ne, kujerên bi hezaran mirova ne û tohmetên wan giranin. Ji bona ev di dadgehên navneteweyî de bên darizandin em xebatên xwe bi wan welatan re didomînin. Mijarek din jî zarok û jinên di kampa Holê dene. Ev zarok bi hişmendî û ferasetên DAIŞ'ê tên mezinkirin û perwerde kirin. Metirsiyek mezin ji bona pêşeroja Sûriyê didin avakirin. Di encamê xebatên peywendiyên derve de, me heya niha gelek zarok û jinên di kampa Holê de dimînin, radestî welatên wan kirine. Di demên pêş de ji plansaziyên me yên cûda ji bona aramî û ewlehîya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dê berdewam bike."

**'Em ê jiyaneke bi aramî ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê peyda bikin"**

Gulîstan Elî wiha axivtina xwe bi dawî kir: "Peyama me ji eve ku, hemû gelên ku xwe gihandine asta azadiyê û şoreş avakirine, em ji hewl bidin wek wan welata bi aram û wekhev jiyan bikin. Emê wek gelê Kurd û herêmê heya asta navnetewî de bê naskirin em ê dengê gelê xwe bidin guhdarkirin li hemû cîhanê. Bila bê zanin ku ev berdêla ku Rojavayê Kurdistanê û herêmê hatiya dayin bi hêsanî ne hatiye serxistin û bi hêsanî ji winda nabe."

# Şoreşgerê bêhempa; Tekîn Goyî

**Navenda Nûçeyan**

**Şoreşgerê kurd Tekîn Goyî bi tevlîbûn, helwest, têkoşîn û rûmeta xwe ya fermandariyê navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka têkoşîna şoreşa Kurdistanê û gelên herêmê de nivîsand.**

Şehîd Tekîn Goyî (îsmet Unver) yek ji şoreşgerên pêşeng ê Kurdistanê ye, li bajarê Şirnexê yê herêma Botanê ji dayik bûye, zarokatî û ciwantiya xwe li erdnîgariya dijwar a Kurdistanê derbas kiriye. Ew di salên destpêkê yên jiyana xwe de bû şahidê zilm û zordariya ku li hemberî gelê wî tê meşandin, bi hişmendiya tolgirtinê biryar da ku tevlî nava refên gerîla bibe. Di temenekî ciwan de bi desteka ku ji malbata xwe girt, di sala 1992'yan de tevlî nava refên Tevgera Azadiyê bû.

Şehîd Tekîn ji roja tevlîbûna têkoşîna azadiyê de, bi biryardariyeke mezin dest bi xebatê kir. Di sala 1996'an de derbasî qada Rêber Apo bû û li vê derê bi perwerdeyên ku dîtine hişmendiya şoreşgerî û ruhê berxwedanê xurt kir û bû şoreşgerekî zana. Bi taybetî piştî dîtina perwerdeyên Rêber Apo, li her qadekê temsîla felsefe, fikir û şexsiyeta mîlîtaniya Apogerî kir.

Şehîd Tekîn têkoşîna xwe ya şoreşgerî li gelek herêmên Kurdistanê berdewam kir. Li qadên ku berxwedan lê zêde bû, weke Behdînan, Botan, Mêrdîn, Qendîl, Rojava û Şengalê bi awayekî aktîf cih girt. Bi keda ku li van herêman da meşandin, li her cihî di dilê gel de cihekî taybet girt û bû yek ji navên sembol ên têkoşîna azadiyê. Di her qadê de bi dilsoziya xwe ya ji gel re û bi biryardariya xwe ya şoreşgerî hat naskirin. Wî hemû jiyana xwe da têkoşîna azadiyê. Bi îrade, coş û fedekariyeke mezin li seranserî Kurdistanê xebat kir. Xwedîderketina li têkoşîna azadiyê yek ji taybetmendiyên wî yên herî girîng bû. 32 salan li her milekî Kurdistanê li ber xwe da û ked da. Bi bawerî, cidiyet, îrade û dîsîplîna xwe ya bilind, ji hevalên xwe yên li derdora xwe re bû mînak. Şehçd Tekîn di vî şerê dijwar de bi giranî birîndar bû û lingê xwe yê çepê winda kir. Lê belê ev windabûna fizîkî nekarî têkoşîna wî ya şoreşgerî bide sekinandin. Berevajî vê, bi coşeke hîn mezintir têkoşîna xwe hembêz kir û erkên xwe yên şoreşgerî berdewam kirin.

Di sala 2014'an de dema ku çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Rojava kir, li ser bangawaziya Rêber Apo ya seferberiyê Şehîd Tekîn bê dudilî berê xwe da Kobanê. Li Kobanê weke fermandarekî xwedî ezmûn di eniya herî pêş a şerê berxwedanê de cih girt. Piştî têkçûyina DAÎŞ'ê ji




aliyê şervanên azadiyê ve, di gelek xebatên xizmetgûzariyê û civakî de pêşengtî kir. Herî dawî di xebatên tenduristiyê de bi awayekî aktîf cih girt, xizmetên tenduristiyê pêşkêşî hevrêyên xwe û gelê kurd kir û di vê pêvajoyê de kedeke mezin da. Bi tevlîbûn, helwest, têkoşîn û rûmeta xwe ya fermandariyê navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka têkoşîna şoreşa Kurdistanê û gelên herêmê de nivîsand. Şoreşgerekî bêhempa bû û bîranîna wî, wê her tim di têkoşîna gelan de bijî. Di 19'ê Tebaxa 2024'an de, dema ku Şehîd Tekîn Goyî (îsmet Unver) li bajarê Qamişlo xebatên xwe yên tendurustiyê didomandin, di encama êrîşeke hovane ya dewleta Tirk a dagirker a bi balafirên bê mirov de şehîd bû.

# Rêber Apo gelê kurd ji nû ve zindî kir

Endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kir ku 25 sal in îşkence li ser Rêber Apo tê meşandin û wiha gotin: "Rêber Apo gelê kurd ji goristanê rakir û ji nû ve zindî kir. Bi paradîgmaya xwe hemû plan û projeyên hêzên serdest û hegomon têk bir."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Hêzên hegemon di 9'ê Cotmeha 1998'an de bi derxistina Rêberê Gelan Abdullah Ocalan a li Sûriyeyê dest bi komploya navdewletî kirin û di 15'ê Sibata 1999'an de Rêber Apo radestî Tirkiyeyê kirin. Di her 9'ê Cotmehê û 15'ê Sibatê de bi girseyî derketin kolanan û komploya navdewletî şermezar kirin. Rêber Apo li êşkencexaneya Îmraliyê berxwedaneke bêhempa meşand û bi paradîgmaya konfederalîzma demokratîk jiyana azad pêşkêşî gelan kir.

Derbarê girêdana gel bi Rêber Apo re endamên Meclisa Malbatên Şehîdan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Rojnemeya me re axivîn.



Siyabend Efrîn



Eyida Xelîl



Cîhan Gilo

**'Fikirê Rêber Apo bingihê jiyanê ye'**

Siyabend Efrîn diyar kir ku fikir û felsefeya Rêber Apo bû numûneyekî jiyanî û wiha got: "Fikra Rêber Apo bû bingeha jiyana nû ji bo her kesî û her kes mafê xwe nas kir. Rêber Apo di dirêjahiya salan de xebatên gelek mezin û giran dida meşandin, da ku civakê di her alî de zane bike, di heman demê de bi salan Kurd ji mafên xwe hatibûn qutkirin û dinava înkarekî re derbas dibûn ku Kurd roj bi roj nav û heybeta xwe winda dikir, Rêber Abdullah Ocalan bû nimuneyekî jiyanî. Di kesayet û fikirê Rêber Apo de hêza çareseriyê gelek girînge, yanî bi hêza xwe ya fikirî bi ser pirsgrêkan de diçe û hewl dide bi riya aqil çareser bike. Ji bo azadiya Rêber Apo jî pêwîst e em di her astê de xebatên xwe bidine meşandin. Rêber Apo di demên xwe de heya niha erka xwe li hemberî her kesî pêk anî, ji lewra ya ku dikeve ser milê me de ew e ku em jî erka xwe pêk bînin û azadiya wê ya fîzîkî mesoger bikin. Ji ber ku girêdana me bi Rêber Apo re roj bi roj zêde dibe û di heman demê de kîna me li hemberî dijmin mezintir dibe."

**'Komploya Navneteweyî dewam dike'**

Siyabend Efrîn wiha gotinên xwe bi dawî kir: "Li cîhanê pêngava "Ji Rêber Ocalan re azadî, ji pirsgirêkên gelê kurd re çareseriya siyasî" hat destpêkirin. Dostên kurdan di 10'ê Cotmehê di li 74 navendan di 10'ê Cotmeha 2023'an de pengava cîhanê dan destpêkirin. Komployên ku dest pê kiribûn îro didomin. Ji ber vê yekê heta ku Rêber Ocalan bi awayekî fizîkî azad nebe, wê her tişt kêm û nîvco bimîne. Heta Rêber Ocalan azad nebe, em çi bikin jî kêm e."

**'Azadiya Rêber Apo wê bi destê jinê be'**

Di heman çarçoveyê de Eyda Xelîl da zanîn ku bi felsefeya Rêber Apo jin xwe ji tariyê derbasî ronahiyê bûn û wiha domand: "Girêdana me bi Rêber Apo re di asta herî jor de ye. Bêguman Rêber Apo fedakartiyekî gelek mezin kir ji bo gelê xwe, wek tê zanîn ku Rêber Apo di pirtûkên xwe de jî li ser jiyan û kesayeta jin radiweste. Di dirêjahiya salan de jin ji mafê xwe hatibû tecrîd kirin û dinava koletiyekî mezin de jiyan dikir. Sîstema zilam her dem jin dixiste dinava çar dîwarên hesnkirî de, lê piştî felesefeya Rêber Apo jin careke din xwe ji wî qalibî rizgar kir û di her qadan de xebatên xwe birêve bir. Her wiha Rêber Apo jiyana me ji nûve guhert, niha di dîrokê de gelek Rêber rabûn ser dika dîrokê lê derketina Rêber Apo gelek cuda bû, ji ber ku Rêber Apo Ronahî da her kesî bi taybetî Ronahî da Jin û hemû ferdên civakê. Ji lewra di derbarê azadiya Rêber Apo de çi were xwestin pêwîst e em bikin, yanî dikarim êda bikim ku azadiya fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan wê bi destê Jin be.

**'Tişta herî zor şoreşa mêjî ye'**

Eyida xelîl di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku pergalê berê bi hemû nirxên gel lîstibûn û wiha pêde çû: "Gel heqîqeta xwe ya bi destê hêzên serdest winda kiribû, dîsa bi pergala Neteweya Demokratîk ji nû ve bi dest xist. Fikrên Rêber Ocalan û paradîgmaya Rêber Ocalan pir zêde bi bandor e. Rêber Ocalan 40 sal berê gelê kurd ji xewa giran hişyar kir. Niha firk û felsefeya gelê kurd heye. Berê jî lehengên gelê kurd ên wekî Qazî Muhammed, Şeyh Said, Seyîd Riza û gelek kesên din hebûn. Raste. Lê van kesan ji bo gelê kurd çi kirin. Negihiştin armancên xwe. Rêber Ocalan digot 'Berî her tiştî şoreşa fikr û ramanê ji bo me lazim e. Têkoşîn tenê bi çikan têr nake. Tişta herî zor şoreşa mejî bû. Lê Rêber Ocalan tercîha herî zehmet kir û dest bi şoreşa hişmendî û mejî kir. Pergala Modernîteya Demokratîk Neteweya Demokratîk û Xweseriya Demokratîk li Rojava pêş xist. Rêber Ocalan Neteweya Demokratîk tenê ji bo gelê kurd pêş nexist. Ji bo hemû gelên bindest û hemû gelên din ev felsefe pêş xist."

**'Mafê jin bi riye fikir û felsefeya Rêber Apo hat xuyakirin'**

Di heman demê de Cîhan Gilo wiha got: "Em ji vir heya gireva Imraliyê bi germahiyek mezin silav û hezkirinên xwe ji Rêber Apo re pêşkêş dikin, eger em li dîroka mirovahiyê bi rengekî rast binêrin gelek Rêber ji bo xizmeta mirovahiyê derketin û hewl dane ku di astek gelek mezin de xizmeta civaka xwe bikin, lê bi demê re ew Rêber têk çûn ji ber ku di astekî mezin de berjewendiyên civakê kêm bû. Lê Rêber Apo ji wan hemûyan lîkolînê wî derketin û li gorî wan tecrubeyan de tevgeriya. Dema ku Rêber Apo derket jin hevalê wî bûn, yanî kesayeta ku bi Rêber Apo re kir di her gava jiyanê de jin bû. Di heman demê de di dîrokê de jin rastî tunebûnekî gelek mezin hat hem di hêla fikirî hem jî di hêla fizîkî de, yanî jin bê maf hatibû ragirtin. Zilamê desthiladar xwest ku fikir û îradeya jin bike bin destê xwe zilam cihek ji bo jin nehiştibû. Lê Rêber Apo wiha kir ku jin bibe xwedî maf û bibe rêveberiya sereke ya civakê. Di heman demê de Rêber Apo dema ku nirxandin dike ji her şexs û pêkhtiyê re nirxandin dike, Rêber Apo berdevkê hemû civakan ne. Niha di Rojavayê Kurdistanê de gelek partî hatin avakirin lê yekî ji wan jî ji bo mafê jin kar nekir, berjewendiyên xwe yên takekesî didane pêş."

**'Rêber Apo gelê kurd ji goristanê derxist û ji nûve zindî kir'**

Necah Gilo di dawiya axaftina xwe de bibîr xist ku Rêberê Gelan Abdullah Ocalan 25 sal in di şertê tecrîdê de di yek hucreyê de tê ragirtin û wiha got: "Heya niha bi ti awayî agahî ji Rêber Apo nayê girtin. Tecrîdê her ku diçe giran dibe. Tecrêdê giran dikin. Li pergala Îmraliyê ev 25 sal in ku îşkence lê heye. Rêber Apo gelê kurd ji goristanê derxist û ji nûve zindî kir. Hemû plan û projeyên hêzên serdest û hegomon tev li hev kir. Dewleta tirk a dagirker ji bo hêzên navdewletî gardiyaniyê dike. CPT jî diçe Îmraliyê û ziyaretan dike, lê van raporên xwe bi raya giştî re parve nake. Rêber Abullah Ocalan gelê kurd ji goristanê derxist û azad kir. Lê niha pergal jî dixwaze Rêber Ocalan têxe wê goristanê. Divê hemû gelê kurd vê rastiyê baş bibînin."

# 1'ê îlonê Roja Aştiya Cîhanê

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê ye, ev roj li hemû welatên dinyayê xwedî watedariyeke mezin û cuda ye. Piştî bidawîbûna şerê cîhanê roja 1'ê Îlonê wekî rojeke pîroz hat destnîşan kirin, da ku bibe roja bidawîbûna qirkirina mirovan. Ev roj, li hemû cîhanê tê pîrozkirin û di vê rojê de herkesê aşîtîxwaz bendewariyên xwe yên aştiyê tîne ziman.**

Di 1'ê Îlona sala 1939'an de Naziyan di bin fermandariya Adolf Hitler de, bi dagirkirina Polonyayê Şerê Cîhanê yê Duyem da destpêkirin. Di Şerê Cîhanê yê duyem de 50 milyon mirovî jiyana xwe ji dest dan. Ev şer roja 1'ê Îlonê dest pê kir û di heman rojê de, di sala 1945'an de bi dawî bû. Piştî şer, Konseya Ewlekariyê ya Netewên Yekbûyî ji bo ku careke din şer destpêneke û aştiyeke gerdûnî pêk were, 1'ê Îlonê weke "Roja Aştiya Cîhanê" ragihand. Êdî 1'ê Îlonê, li navendên cîhanê yên curbicûr bi pîrozbahiyên cihêreng tê pîrozkirin. Li gel ku 1'ê Îlonê Roja Aştiya Cîhaniye jî, lê dîsa li dijî Şengal, Rojava û Başûrê Kurdistanê êrîş hene û bi deh hezaran kurd tên kuştin û tu kes dengê xwe nake, tevî ku li pêşiya wan jî diqewime lê mafê kurdan tên xwarin.

**Tevî îmzekirina peyama aştiyê jî lê hîn şer berdewame**

Di dîroka mirovahiyê de bi hezaran şer çêbûne. Gelek şer neketine rûpelên dîrokê de. Lê hin şer hene him ji ber ku gelek mirov hatine kuştin, him jî ji ber teknîk û rêbazên xwe di rûpelên dîrokê de cihên xwe girtine. Bi piraniya şerên di navbera du aliyan de pêş ketine, aliyekî êrîş kiriye, aliyê din jî li dijî êrîşan parastina xwe kiriye. Ji ber vê yekê li ser rûyê cîhanê gelek keleh, sûr û birc hatine avakirin. Bilindbûn û heybetiya van keleh û bircên hatine avakirin, nîşan didin ku bi şer û êrîşên çiqas mezin re rû bi rû mane. Di dîrokê de gelek şerên mezin pêş ketin. Di şerê nava dewletan û şerê global de bi sed milyonan mirov hatin kuştin. Di van şeran de gelek cûreyên çekan hatin bikaranîn. Li gel ku ewqas xwîn rijiya û bi milyonan mirov hatin kuştin jî, lê dîsa hêzên navdewletî di şer de israr dikin. Li gel ku peyman û quralên şer di nava dewletan de hatin îmzekirin û qebûlkirin jî dîsa




peyman û quralan binpê dikin. Dîsa her roj bi sedan mirov li ser rûyê cîhanê di şer de tên kuştin.

**Aşîtiya Cîhanî wê bi destê jinê pêk were**

Îro gelek mirov ji watedariya aştiyê dûr mane. Rojane êrîş û qetilkirin li ser mirovan tê meşandin. Di vê navberê de em çiqas dikarin aştiyê bi rengê wê yê rast bidin nasîn. Girîngiya aştiyê di şexsê mirovan de tê avakirin, yanî em dikarin bêjin eger mirov fêrî rastiya jiyana azad bibe wê çaxê ji bo mirovên din jî dikare aşîtiyê pêşkêş bike. Mêr her xwe ji bo şeran amade dibînin da ku civakên aram û aştiyane neyên avakirin. Berovajî vê eger qala jinê bikin em dibînin tim yên ku li peyî aşîtiyê ne jin in. Loma heger aştiyeke cîhanî çêbibê jî wê dîsa bi destê jinan pêk were.



# Kevirên girêdayî îşareta êrîşa kûçikên serberdayî ne

Di 23'yê Tebaxa 2024'an de, li Başûrê Kurdistanê navçeya Seysadiqê balafirên bêmirov yên Komara dagirker ya Tirk li erbeya rojnamevanan da. Di vê êrîşê de rojnamevan Gulîstan Tara û Hêro Bahadîn hatin şehîdxistin û nêzî 6 kesan jî birîndar bûn.

**Dizgûnê Dewrêsh**

Armanc kirina seyara rojnamevanên jin sûcekî cîhaniye ku ew, bi xwe mirovên sîvîl in. Binpêkirina hemû rê û rêbazên hiqûqa navdewletiye. Lê "cîhan kiye" careke din hêjayê pirsê ye. Lewra hiqûqa cîhanî bi vî awayî dibe hiqûqa xwezayê ku "kê keys anî û yê din ji holê rabike" yê. Zilhêzên cîhanî vê yekê bizanebûn razî dibin ku di encamê de ev qanûnên ku îro wan jî tengav dike bi vî awayî were rizandin daku rê ji wan re jî vebe. Bêdengiya li hemberê vê bûyerê jî di navê de; li hemberê hemû êrîşên dewleta tirk li ser axa me, vê rastiyê nîşan dide. Kevirên girêdayî îşareta serberdana "kûçik" an e.

Ji hêla din ve jî, rola şerê wekaletê ku bi dewletên heremî yên hevkar re didin meşandin heye. Ev dewletên li herêmê jî vê armanca bêbext ya zilhêzan, bi bêbextiyên xwe tacîser dikin. Bi vê keysê û hevkariya tarî bindestî û mûxalîfên xwe ji holê radikin. Komara tirk, jî bi tecrûba sedan salan ya dîplomasiyê hemû amûrên destê xwe, li hemberê me bikar tîne.

Tevahiya bazarên xwe, hemû çûyîn - hatinên xwe ya nav dewletî de bi stratejiya "Ezê çawa Kurdan bê nefes bihêlim, ji holê rakim" tev digere. Eva ji xwe re kiriye zagona esasî.

Bêhna Kurd û kurdî ji çi bê dijminê wê ye. Kes nebêje "bi hindek hêz û rêxistinan re hevkarî dike" yan jî "Dewleta tirk ji ber gotin û samîmiyeta me nerm dibe" Ev bawerî ji binî ve şaşe. Dagirkerên Kurdistanê, nexasim tirk, tu car bi tu dezgeyek Kurd re îtîfaqê nake û nekiriye jî. Armanca, wan tenê heta biserxistina karê xwe ye yanê demî ye. Ku karê xwe qediya ji piştê ve xençerê dixe nava dil û dikûje. Lê ev rastî, her ku nifş diguherî zêdetir şîlo dibe, loma jî gel vê rastiyê çiqasî dibîne mijara serî êşandinê ye. Medya herêmê, mixabin êdî zimanê dijminane ya Komara tirk di rihê xwe de normalîze kiriye. Têgeh û gotinên wan êdî eşkere bikar tînin. Li ser media digital bi rêxistinên sîxûrî yên dijmin re heman şerê psychological warfare yanê "şerê derûnî" dikin. Tam wekî troll. Bi hezaran ji vana dest bi "kar" kirine, her roj bi mejiyê mirovan dilîzin. Ji ber ku bersiv ji van keftaran re kêm tê dayîn her roj zêdetir û bê exlaqîtir zimandirêjî dikin, heqaretan li nirxên vê civakê, dikin. Van bêbextana vê wêrekî û rû ji helwesta rêveberiyên herêmê digirin. Vana bi hêza ceza kirinê, ku ji dijmin û hevkarên wan girtine çavê mirovan ditirsînin; ev tirs ji xwe re kirine mertal. Bi vê parastin û pişta tarî ye ku bê bersiv dimînin. Kuştin û girtina rojanmevanan li ku derê dibe bila bibe îşareta sergirtina rastiyê ye. Pakrewan Gûlîstan û Hêro qurbaniyên vê armancê ne.



Li pişt peymanên di navbera Êraq – Tirkiyê pêkhatine hebûna hêzên zilhêz çiye çiqas e û armanc çiye niha ne zelal be jî, tê zanîn ku hin tişt hene bingeheke fêrbûnî di nava mejiyê mirov de bicîh dikin û kengê rewşeke nêzîkî vê bingehê xwe da hîs kirin ew fêrbûn, dibe bingeheke nû. Lozan û ceato / cento /meto an jî "Pakta Bexda" yê yek ji vanaye ku di nava mejiyê dagirkerên Kurdistanê de rûniştiye. Herçiqas kevn bûye û kaduk buye jî vê rastiyê ji holê ranake. Serkêşê vê jî - bi hevkariya DYE yê re - Brîtanya ye. Ji ser re tenê DYE xûya bike jî, navenda wê ya li ser nefta herêmê didome û tifaqên herêmê hîna jî li ser hîmên wê dûrneketin e. Lê pir mezin kirina vê tifaqê, jî ne di cîhde ye. Bi vê şêwe fikirîn tenê bêhîvîtiyê li pêş dixîne. Ji lewra ev tifaqa navbera Îran - Iraq - Tirkiye – Pakîstanê, li gor parve kirina cewherên stratejîk yên îndûstriya wê demê ye û formeke polîtîk yê bo wê serdemê ye. Îro bersivê nade pêdiviya "choreography ya polîtîk" a cîhanî yên vê gavê. Na ! her kes û her dewlet li gorî fermannameyên Tirkiyê tevnagere. Belê berjenwendiyên xwe difikirin. Lê eger ew berjewendî, di garantiyê de nebin ango vê zelaliyê nebînin, li pişt vê peyman û li hevkirinan nemînin, berê xwe biguherin cîhekî din. Lewra her tişt her dem û li her deverê sûdê nade. Sermiyanî jî sûdê dixwaze. Ji ber vê nezelalî kes, her dem li pişt komara tirk namîne û wê nemînin jî. Di dinyaya kapîtalîst de gotinek sereke heye ku wekî ayetek pîroz tê qebûl kiri. "Dem pere ye" . Mînakên şênber yên werin dayîn gelek in. Mesela Tirkiye, di nava şertên hundurîn de ava çemên Firat û Dîcleyê heya kengê bi çêkirina bendavan bernede bibire li ser Suriyê û Iraqê şantajan bike?

Sermayedarên ku dixwazin zûtir ax û dewlemendiya Bakûr û Başûrê Kurdsitanê ji wan re bi atmosfereke bê şer û pevçûn bê pêşkêş kirin li ser çend salan li hev kirin e? Tirkiye bi çend salan wan bi vê bendewariyê ji xwe re bike pişt? Ma ne ew bû ku digotin di pîrozbahîyên sedsalîya komarê li ser cendegê PKK'ê pîroz bikin. Kanê çi bû? Salek jî ser wê bendewarî re derbas bû. Kelên DIMDIMê zêdebûne. Belê şerekî giran heye û bêdengiyeke muazzam ji vê xwînxwariyê re li "Girava Dek û Dolaban" hatiye plan kirin. Lê rika Kurdî vê lîstika muazzem bişkîne û fîrmayên cîhanî xewna "kredîbîlteya bê dawî" ji holê rakin. Yên xwestin trajediya me ji Kobanê bidin destpê kirin çawa reviyan kûçeyên xwe, vêcarê jî encam bi heman rengî be.

Ji vê jî wêdetir, hemû îqtîdarên îro temsîl û nûneriya hin sektorên sermayedarî dikin. Sermayedarên ku ne di nava vê tifaqêde ne jî li dijî wan bin, dinya ji van rêvebiran her û her nehewîne. Reqabeta navbera wan firsendên din ji me re bîne, keysên din werin. Ya herî girîng jî dinya, tenê ji rûhê îro yê durû pêknehatiye. Têkoşerî û qêrîna vî gelî ya bo azadî, hêrsa vî gelî, dek û dolaban deşîfre dike wê bê bihîstin. Lîstik xera bibe û hesabên şaş hilweşin.

Salên nodî ji bîra we neçûne. Dema 4 hezar gund li bakûr ji holê radikirin. Dîsa ev bêdengî û nixûmandina rastiyan dihate armanc kirin. Loma rojnamevanên Kurd dihatin kuştin, ên biyanî dihatin dersînor kirin. Plan dîsa heman plan bû "Kuştina di nava bêdengiyê de" ya gelê me; me Kurdan bû. Lê tişta ku hesabên vê bêdengî têk bir dîsa ev "Rika Kurd" bû. Ew hesaba bi vê rikê hate têk birin. Destûra terora sîgnalî ku diavêtina ser weşana Kurdî, cezayên dijminane ya madî, êrîşên ser sazî û dezgeyên li derveyê welat, betal kirina lîsansa weşanê; tev ji adresa terora dewleta tirk û hevkariya hin zilhêzên cîhanî derdiketin. Lê dawî de -.tam dev jê bernedane jî li hemberî vê rikê sist kirin. Paşerojê wê dîsa dibe ku dest biavêjin vê bikar bînin. Lê bi demdirêjî bo wan ne kiryareke rentabl e.

Di vira de xala girîng ne tenê hebûna têkoşîna gel e; senkronizasiyona vê têkoşînê li hemû perçe û dezgeyên netewî ye. Kilîta bi sir û efsûnî ev e. Qada dîgîtal ya medya Kurd divê vê rolê bigire ser xwe. Zimanê heqaretê, dijminatiya nav mediyayê rê li pêşiya gîhştina rastiyê digire dixitimîne. Ji xwe ev rêbazana ne sudewar in jî. Tenê dijminê gelê me ji vê sûd werdigirin. Siyasetmedar kîjan zimanî bikar tînin ew li gor pêdiviyên hundurîn tesbît dikin û dibêjin rast an jî şaşe. Lê medya, me nakeve vê atmosferê û nabe şûrê perçekirina civaka netewî. Rexneyên bi îsbat û delîl rêbaza sereke etîka hîmî be. Pirsa Berfîn Hêzîl "kûve diçin, kûve diçin ? Çima vî gelî naparêzin ! zimanê herî sûdewar û rast ya medyayê ye. Hewldana gîhandina rastiyan ji gel re astengiyan bi destê xwe çênekin. Heqaret û nebaşiyên heyî çiqasî bi zimanekî pak bîne zimên di nava gel de ewqas bibe sedem ku gel hevkariyeke rast bihevre bike û di meşa azadiya xwe de gavên serkeftî biavêje.

Dem ya xwe rizgar kirina ji bindestiya dagirkeran e, ji bo vê, pîvanên herî nizm yên li hev kirina nav xweyî ji pîvanên bindestî hezar carê çêtir in. Vê rikê em nîşan bidin û eniya perçekirina me têk bibin. Xurtbûn û yekîtiya me, dostiya gelan (ji ne biratiyê) re çi xeteriyê tîne? Ku ev dostanî îro tune dêmek ne ji me ye. Ku piştî me xirab dibe dêmek ev dostanî ji bo daqûrtandina me bûye! Eger dostiyeke rast û durist pêwîst be wê demê ev, ji b er nebûna me têk çûye, ne ji xwedî nasnamebûna me wê têk here. Dewletên heyî ku ji vê rewşa me sûd werdigirin û oldarên heyî vî fikrê bêbextî derpêş dikin tev hevkarên plana esareta me ne û me bi vê dixapînin. Minakek ji xwezayê: Li tu derê jiyana kulîlkên herêmê, bi hatina cûreyeke din kulîlkekî jiyana wan ya xwezayî neketiye xeterê, berovajî dewlemendtir û delaltir bûye.